

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (141) Sal 24 07 Gulan 2019 z - 2631 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# «Dewleta» Daişê... Hate herifandin

**Desteya sernivîser**



«Li Baxozê endamên DaiŞê xwe radestî Hêzên Sûriya demokrat dikin- Ajansa Nûçeyan a Firatê »

Li roja 23.03.2019an, Piştî rizgarkirina bajarokê Baxozê yê girêdayî parêzgeha Dêra Zorê û ragihandina fermî ya têkbirina rêxistina terorist «Daiş» li ser destê Hêzên Sûriya demokrat «HSD» bi piştevaniya Hevbendiya Navnetewî, li Sûriyê, qonaxeke nû destpê kiriye, ew jî qonaxa piştî Daişê ye. Ew rêxistina ku xwîna mirovên bê sûc û bê guneh li Sûrî, Iraq û gelek deverên din ên cîhanê rijandiye, bi hovîtî serê mirovan jêkiriye, li kolanan bi daran ve daleqandî hştiye, tirs, saw û mirina reş hawîr belav kiriye, îro ji holê rabûye, bask û perên wê hatine şikandin. Mirov dikare bibêje ku roja têkbirina Daişê, ji hemû gelên cîhanê re rojeke pîroz, serkeftin, mizgînî û şahiyeke mezin e.

Zaniyar û pisporên siyasî tekez dikin ku raste di meydana şer û leşkerî de ev rêxistin têkçûye, lê wekû raman, bîrbawerî û boçûn, hê jî ew li ser piyan e, metirsî heye ku dema ew derfetê bibîne,..........

2

# Li Cizîrê roja rojnamegeriya kurdî hate pîrozkirin

Di 121emîn salvegera derçûna rojnameya Kurdistan di 221898/4/ê de, li bajarê Qahirê, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), roja 26.04.2019, li gundê Dirêcîkê - Şiharê kerikê - bi beşdariya cemawerekî mezin, hevalên rêxistinên navçeyên Cizîrê û serkirdayetiya partiyê li Cizîrê, bi coşeke mezin ev roj bi bîr anî.

Çar komên foliklorî yên partiyê Buhar (Kobanê), Mîtan (Serêkaniyê), Helebçe (Hesekê) û Çarçira (Aliya) bi çalakiyên xwe aheng zengîn û geş kirin.

Li destpêkê, ji cemawer hate xwestin ku demeke bê deng li ser giyanê pakrewanên kurd û kurdistanê, herweha li ser giyanên rojnamevanên kurd, rawestin, digel sirûda Ey reqîb.



Gotina kovara Pirs û weşana Neweoz ji bal mamoste Newaf Bişar endamê desteya sernivîser a pirs û Newroz, hate xwendin.

Gotina weşana Yekîtî (الوحدة) ji bal mamoste Hisên Bedir endamê desteya sernivîser ya weaşana YEKÎTÎ hate xwendin, li ser roja rojnamegeriya kurdî axivî û rola malbata Bedir Xaniyan..........

3

# Di jiyanê de bê hêvî nebe!

**Newafê Bişar**

Li jiyanê, temenê mirov kin e û rojên wî hindik in. Hema ew çavan vedike, li xwe dizîvire, ciwanî bar dike, porê sipî di bin cênîkan de diçirisîne, buhara temen diçilmise û li şûnê, kalbûn konê xwe vedigre, pê re jiyan bi te›lî, nexweşî û giranî derbas dibe. Piştî demeke kin, mirov çavan digre, koça dawîn dike û xatir ji vê gerdûna gewrik dixwaze diçe, ew tenê du tiştan li şûn xwe dihêle, yek jê komek ax e û ya din jî kar, nav û dengê wî ye.

De vêce eger wî/wê ji bo gelê xwe berhemine baş pêşkêş kiribin, bi dilsozî xebateke qenc kiribe, ew bi rûmet di bîra gel de dimîne, jê pê ve, tiştekî din jê namîne.

Bê gomane ku li ser xaçerêyên vê jiyanê mirov rastî gelek asteng, nakokî û pirsgirêkan tê û bi hin bûyerên reş û xemgîn re rû bi rû dibe, derûna wî pê birîndar û bêhna wî teng dibe, melûl û bêzar dibe. Ev rastiyeke jiyanê ye û bi hemû mrovan re çêdibe. Li hemberî van pirsgirêk û bûyerên bi êş û jan, pêwîste mirov ji desthilanînê nekeve, bê hêvî nebe û ala sipî bilind neke, xwe bi hêsanî radestî neyaran neke û ji bo bidestxistina mafên xwe, bê westan ew berxwedanê bike, ji ber ku bêhêvîtî mirin e û berxwedan jiyan e.

Herweha divê em bawer bin ku girî, reşgirêdan û porkişandin tu pirsgirêk diho çareser nekirine, îro jî ew çareser nakin, berevajî, ew rêyên çareseriyê li ber mirov winda dikin û wan bi girêka kor girêdidin. Ji ber vê yekê pêwîste bi hişekî vekirî, em li şaşiyên xwe mikur bên, berî ku ew mestir bibin, em çareseriyê ji wan re bibînin.

---

**«Dewleta» ... Dûmahîk**

rengekî dîtir serî hilde, careke din teror, kîn û tewana xwe belav bike!.

Di mercên nezanî, xizanî û bêkariyê de, di siha rijêmên diktator ên kujer û devbixwîn de yên welatên xwe kirine zindan û dojeh, zemîn ji bo geşbûna raman û baweriyên tund û hişk, amade bûye, xelkên perîşan ên wan welatan ji bo guhertina rewşê berew başiyê, hema destên xwe dipelînin û çi ji wan bête xwestin, bê dudilî ew ê bikin.

Li devera Rojhilata Navîn û bakurê Afrîqayê, hêzên tewan û tariyê yên mîna Tevgera Ixwan Elmuslimîn û rêxistina El Qayide ji nêzîk ve wê rewşê dişopînin, xwe di bin perdeya diruşmên olî de vedişêrin û nêzîkî wan perîşanan dibin. Pereyan didine wan, hêdî hêdî, wan birêxistin û çek dikin û ji bo berjewendiyên xwe wan bikar tînin. Vêca, ji niha û şûn de, gava herî giring û kêrhatî ew e ku xebateke hevbeş li ser asta cîhanê ji bo qelskirin û lawazkirina ramana olî û hişkbaweriyê birêve here, mizgeft, perwerde û xwendina dibistan û zanîngehan bêne kontrolkirin, fêrkirin û belavkirina çand û gotara kîn û zikreşiyê bête qedexekirin û li şûna wê, çanda mirovhezî û aştiyê bi cih bibe.

Ji hêleke din ve, bi armanca hilkirina vê ramana çewt û sexte ji kokê ve û birîna şaxên wê, pêwîste bi biryar û alîkariya civaka navnetewî, xebateke hevbeş bi rêve here, da ku rijêmên totalîter ji ser singa gelan rabin, demokrasî belav bibe, rewşa aboriya wan xweş bibe û ben li stoyê wan sist bibe, zanistî û çanda nûjen a mafên mirovan bi firehî belav bibe, zor û zordestî ji ser sînga gelên bindest rabe, û li gora zagonên rêxistina Yekîtiya Netewan, bê cudahî, hemû gel maf û azadiyên xwe wergirin, tu kes mafê kesî binpê neke, koletiya mirovan, ew diyardeya kirêt ji cîhanê rabe û bikaranîna wê weke sûcekî giran bê hejmartin, û rêxistina navnetewî cihê xwe yê berz bistîne, pirsgirêkên mezin ên cîhanê bi dadmendî çareser bike.

Li welatê me Sûriyê ku ev e heşt sal in ew toşî şerekî gemar bûye, bi sedê hezaran welatiyên bê guneh bi çekên cûr bi cûr hatine kuştin, mal talan bûne, gund û bajar hatine herifandin, û bi milyonan welatî penaber bûne. Ji bilî van hemûyan, dewleta Turkiyê hin deverên welêt mîna Efrîn, Cerablus û Idlibê dagir kiriye, ku ta roja îro rijêma Sûriyê giliyekî fermî jî li cem Yekîtiya Netewan nekiriye!.

Ustubarê dewletên mezin ên cîhanê ye ku bi dilsozî ew destê alîkariyê dirêjî gelê Sûriyê bikin û wî ji vî agirî rizgar bikin. Û berî her tiştî, pêwîste ku hemû hêzên leşkerî yên biyanî ji welêt vekişin û rê li pêş diyalogê di navbera hêz û aliyên siyasî yên Sûrî de dûz bibe, ji ber ku hatin û mana hemû hêzên leşkerî yên biyanî li ser xaka Sûriyê ne rewa ye, ew ji bo armanc û berjewendiyên xwe derbasî welatê me bûne, welat wêran kirine, ramanên çepel, gurî, çanda kîn û zikreşiyê di navbera pêkhateyên welêt de çandine, û bingehên bawerî û jiyana hevbeş bi xurtî hejandine.

Herweha, pêwîste ku hemû hêzên siyasî yên welatparêz ên Sûriyê, hişmend û kesayetiyên welatparêz ên navdar, ji bilî yên ku xwe firotine neyar û jê re bûne destik û xulam û li ser kurtêlên wan dijîn, vê rastiyê bizanin. Hemû alî li nerîn, hilwest û cîgehên xwe vegerin, hilwestên xwe binirxînin, hevdû bipejirînin û paşeroja gelê xwe pilan bikin, tevaya pirs û kêşeyan digel doza Kurdî li Sûriyê di çarçewa sînorên welêt de û li gora zagonên navdewletî çareser bikin, bersivên hemû pirsan bidin û rê li pêş hişkbawer û geşbûna ramana tundrew bigrin, û welatê xwe ji nû ve, li ser bingeheke nû, makezagonek nûjen û çanda mirovheziyê ava bikin.

# Salek ji dagirkirina Efrînê



**Nazdar Hesen**

Salek xwînî û tarî di ser Efrîna birîndar re derbas dibe .Salek ji êş, kul, keser û xemgîniyan dagirtî , salek ji kuştin , girtin , talankirin, wêrankirin û dagirkirina sêsed û şêst û şeş gundên Efrînê . Salek ji rûxandina peykerê Kawayê hesinkar. Cihên wê yên dîrokî û goristanan û guhartinên navên gund û qadên wê. Salek ji hewldanên dagîrkeran û hevalbendên wan bi herhawî Efrînê ji holê rakin û ji dîrok û nasnemeya wê rût bikin, û bi çirava terorê kin . Salek ji zîndankirina Efrînê û talankirina xêr û bêrên wê , salek ji koçberiyê û belengaziyê û ji hovîtiya bi termê Barîn Kobanî hatî kirin û ji sotina dilên dayîkên pakrewanan. Salek ji bêdengdiya hemû rêxistinên navnetewî û mafmirovî û ji qels û xemsariya biraderên me yên Kurd.

Belê salek derbas dibe û Efrîna me ya birîndar kula dilê xwe derman nekiriye û nekewandiye û ta niha tu çirûskên hêviyê û çareseriyê li asumanê wê xuya nebûne. Belê ji ber ku tu bi nasnemeya xwe ya kurdî navdar bûyî, tu li ser hev, bi hêz û bi zana û welatparêziya xwe naskirî bûyî, gunehê te mezin bû, ji ber wê jî, hemiyan destên xwe ji te ber dan û ev bobelata mezin bi ser te de anîn, lê çendî dijmin û dagirker hewl didin bi pîlanên xwe yên kirêt, birînan li te vekin û li ser tunekirina te bixebitin, ewê tucarî bi ser nekevin, bi vîn û têkoşînên lehengên te, tu yê bi ser kevî û serfiraz bibî, û li xwediyên xwe yên resen vegerî û vegerî Efrîna rengîn.

# Şandeke Partiya Yekîtî ya Demokrat (PYD) Seredan navenda Partiya me li Qamişlo kir

Îro, Duşembê 29.04.2019, şandeke payebilind a Partiya Yekîtî ya Demokrat (PYD) seredana Navenda Partiyê li bajarê Qamişlo kir. Şanda PYD ji birêzan: Foze Yûsif, Asiya Abdulla, Salih Muslim, Ebdulkerîm Umer û Ebdul Îlah Erebû pêkhatî bû. Şand ji bal birêz Mihyedîn Alî -Sekreterê Partiyê û hin endamên serkirdayetiya Partiyê hate pêşwazîkirin.

Di hevdîtinê de, rewşa Sûriyê û qonaxa piştî şikestina leşkerî ya rêxistina terorist Daiş û paşeroja deverê hate gengeşekirin.

Herweha di çend rojan de pir şandeyên partiya û kesayetiyên serbixwe serdana navendê kirin.



**Li Cizîrê ... Dûmahîk**

di pêşketina çand û rojnamevaniya kurdî de axivî.

Di gotina rojnameya YEKÎTÎ de wiha hate gotin:( Dema mirov li ser ragihandina kurdî û kurdistanî dipeyive, digel pêşketina rojnamegeriya kurdî di gelek aliyan de, lê ji nakokiyên partiyane dikaze) ...Amaje bi alavên ragihandinê yên rengereng kir û pêdiviya ku zimanê diyalokê bikar bênin. Di dawiyê de, doz kir ku çanda aştî, azadî û wekheviyê were belav kirin.

Komên foliklorî bi dîlan, stran, şano û helbestan ev çalakî rengîn kirin ku cihê şanaziya cemawer bûn, nemaze şanoya Efrîn ya ku ji bal koma Çarçira ve hate pêşkêş kirin, herweha dîlanên koma Buhar û çalakiyên koma Mîtan û Helebçe, ku ev roj rengîn kirin.

Hêjayî gotinê ye ku komîta xelata nemir Kemal Henan B. Şiyar diyarî endamê desteya sernivîs ya weşana Newroz gorbuhişt Diljar Seyda kir, birayê wî brêz Silêman Mihemed xelat wergirt û bi kurte gotinekê spasiya komîta xelatê û malbata nemir Kemal Henan kir..

Di dawiyê de cemawer jî tevlî dîlanan bû .

Li jêr, em deqa gotina Kovara PIRS û weşana NEWROZ ji xwendevanên xwe yên xoşewist re pêşkêş dikin:

# Digel hemû êş û azaran, Roja rojnamegeriya Kurdî cejin û şahî ye*



Ji ber sedema nesaxiyê, li zivistana sala 1898an, bi armanca ku dermanekî ji êşa xwe re bibîne û saxlemiya xwe vegerîne, Mîr Miqdad Midhet Bedirxan ji Istenbolê berê xwe dide Misrê û demekê li paytexta wê dimîne. Li wî bajarî dibîne bê çawa xelk dixwînin û di warên zanîn, wêje û pîşesaziyê de gavên mezin davêjin, bi dehan rojname, kovar û pirtûk têne çapkirin û belavkirin, ew ên ku rêya pêşketinê li pêş gel ronî dikin, ramana wî geş dikin û wî bi nûçe û bûyerên giring serwext dikin.

Mîr, bi kul û hesreteke mezin vê rewşê bi ya gelê xwe re berhev dike, digihe encama ku gava pêşîn ji bo pêşketina gelê Kurd, belavkirina zanînê ye. Û gava pêşîn ji belavkirina zanînê jî weşandina rojname û vekirina dibistanan e. Ji ber vê baweriyê, ew biryarê dide ku dest bi vî karî bike û ji bo Kurdan rojnameyekê bi zimanê Kurdî li Qahîre yê biweşîne, û her car 2000 hejmar rêke Kurdistanê da ku Kurd bixwînin û asta zanebûna wan bilind bibe.

Li roja 22ê Nîsana sala 1898an xebata wî ber girtiye û hejmara yekem ji rojnameya xwe ya bi navê **KURDISTAN** bi nav kiriye bi zimanê Kurdî û tîpên Erebî Osmanî wşandiye. Bi vî karê xwe yê mezin, ku di dîroka gelê Kurd a nûjen de yekemîn rojname bi Kurdî tê çap û belavkirin, mîrê me zimanê Kurdî li kêleka zimanê gelên cîhanê cîwar kiriye, rûmeta wî parastiye, û mîna hemû gelan, gelê Kurd jî bûye xwedî ragihandin û rojname, û vêga ew roja dîrokî, ji me re bûye rojeke pîroz, bûye şahî, bûye cejina rojnamegeriya Kurdî.

Di pêşgotina hejmara yekem de, mîrê me armancên xwe ji derxistina rojnameyê wiha diyar dike û dibêje:

*«... gund û bajêrên hemiya de, mekteb û medrese û cerîde henin. Dinyayê de çi dibe, çi nabe, cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re, Kurd ji gelik qewma zêdetir xwey hiş û zeka ne, camêr in, dînên xwe de rast û qewî ne, xurt in, û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in. Dinyayê de çi dibe, cîranê wan Mosqof çawe ye, wê çi bike, nizanin. Lewma, riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî. Bi izna Xwedê te›ala, paş niho her pazde roja de carekê, ez ê cerîdekê binivîsim.*

*Navê vê, min kiriye»Kurdistan». Vê cerîdeyê de, ez ê behsa qenciya i›lm û me›rifeta bikim, li kû derê mirov di›elime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene, ez ê nîşa Kurda bikim, li kû derê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawe şer dikin, ticaret çawe dibe, ez ê hemiya hikat bikim. Heta niho, kesî cerîdekî holê ne nivîsîye. Ev cerîdeya min a ha, ya e›wilî ye. Lewma, wê gelik kêmayî hebitin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re binivîsin. Hemî tişt wekî nû çê dibin kêm in, paşê hingî diçe, dikeve rê de. Eve êdî ez ê dest meqsedê bikim. (we mine ellahî el tewfiq)..»*

Lê sed mixabin, piştî derçûna vê rojnameyê ku ji Kurdan re cihê dilxweşî û mizgîniyeke mezin bû, zikreş û kîndarên derdora Sultan Ebdulhemîd dilteng û çavsor bûn, jê xwestin ku yekser ew rê li ber derçûna vê rojnameyê bigre, rawestîne. Sultan radibe hoşdariyê dide mîr **Miqdad** û dibêje ez nahêlim li ser qada dewleta Osmanî ku Misir parçeyek jê ye ev rojname bête weşandin!.

Mîrê gewre çendî naman jê re dişîne û hêvî dike ku ew derfet û rêdanê bide rojnameyê da ku ew asta zanînê li ba Kurdan bilind bike, lê Sultan gotin û hêviyên mîr nabihîze, wan red dike!. Mîr neçar dibe, piştî belavkirina hejmara 5an a ku roja 27ê Muherrem a 1316 ê Koçî beramberî 16ê Hizêrana 1898an, ew rojnameya xwe radiwestîne û vedigere Istenbolê rûdine, jiyana xwe berdewam dike. Piştî demekê, birayê wî mîr **Ebdurehman Bedirxan** barê berdewamiya wê rojnameyê hildide ser milên xwe û di pêşgotina hejmara 6an de wiha dibêje:

*« ... Ev cerîdeya ha, heta niho, birayê min Miqdad Begî derdanî, lakin, çiku Xinkar nehişt ew li Misrê rûnit, vegera Istanbolê. Cerîdeya xwe nikarî Istambolê derînit, seba wê jî çiku mirovê mezin yê dor xinkar hemî xayin, bê esil neseb in, neyarê..........*

5

# Diljar Seyda hate bibîranîn



Bi boneya yekemîn salvegera koça dawî ya nemir heval: Mihemed Zekî Mihemed (Diljar Seyda) ahenga bîranîna wî hate lidar xistin..

Li hola Silêman Adê, li bajarê Qamişlo û bi beşdariya dost, hezker, malbat û hevalên wî ji navçeya (Qamişlo - Tirbespî) û navçeya Dêrikê, ev roj hate bibîr anîn.

Di destpkê de, heval Hekîm Ehmed xêrhatina beşdaran kir û ji wan xwest ku demeke bê deng li ser giyanên pakrewanên kurd û kurdistanê rawestin, paşê ew li ser kurtejiyana nemir Diljar Seyda axivî .

Gotina partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, heval Nûşîn Bêcirmanî endamê navça ( Qamişlo - Tirbespî) pêşkêşî beşdaran kir, ew li ser sênc û baweriyên wî rawestiya, xebata wî di ber doza gelê kurd, çand û zimanê kurdî de, diyar kir û got: Nemir tu cara li kesyatiya xwe nedigeriya, lê wî temenê xwe di ber baweriyên xwe de, terxan kiribû.

Mamoste Ehmed Erefat, endamê komîta rêvebir ya Saziya Fêrkirin û parastina zimanê Kurdî gotina wê xwend, ew li ser xebata wî ya dûrdirêj di ber zimanê kurdî de bi ferehî rawestiya.

Bi navê malbata wî, heval Silêman Mihemed axivî, da xuyanîkirin ku koça nemir Zekî, birîneke dijwar û kûr e, di heman demê de spasiya beşdariya wan kir, nemaze yên ku di ber vê çalakiyê de liv û xebat kirine.

Pişt re, berê xwe dane goristana Cirnikê ya nû, li ser gora wî rawestiyan û destpêka Qurana pîroz xwendin, soz dan ku li ser rêça wî berdewam bin.

Di dawî de xatirê xwe jê xwestin.

---

**Digel hemû ... Dûmahîk**

*ciwnmerda ne, çi xesma ku yek ji wan heye navê wî Ebu El Huda ye. Ew temamî esil û neseb mitirb e. Çiku ew ji hemiya bê esiltir e, ji hemiya zêdetir neyarê mala Bedirxan Begê ye. Ew neyarê hemî Kurda ye, navê qencî li Kurdan bibe. Ew Xinkar dixapîne. Be rastî, ew ne Ebu El Huda ye, ew Ebu El Delal e, fusq û hesedê de bê heval e!!. Ew nahêle lawên Bedirxan Begê cerîdeyek holê derêxin da qencî ji Kurda re bibit. Lewma ez ku lawê Bedixan begê me, ji te›esub û himyeta xwe , ji milkê Xinkar derketim hatim diyarên xerîb da ez vê xidmetê ji weten û ji miletê xwe re bikim. Ji kerema Xwedê hêvî dikim ku Kurd jî pê vê cerîdeyê ji xewa giran a kevnesala şiyar bibin..»*

Di merc û hoyên pir dijwar de, ji derveyî sînorên dewleta Osmanî, li derbideriyê û her çend mehan ji welatekî Ewropayê, Ebdurehman Beg 26 hejmarên din diweşîne. Û «KURDISTAN» a hêja ku ji gelê Kurd re bûye jêder û samaneke mezin, li hejmara 31an yekcarî radiweste, çavan digre, û navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka gelê Kurd de dinivîse.

Wekî çawa wê demê mirovên zikreş û kîndar ên mîna Ebû Elhuda hebûne, dijayetiya gelê Kurd kirine, îro jî ew bi hizaran hene, û da ku li hember daxwaz û azadiya Kurdan kelem û astengan peyda bikin, ew hemû bi hev re dixebitin û hewil didin dîrokê şûnde vegerînin. Di vî warî de, mînaka herî berbiçav û balkêş rewşa **Efrînê** ye ku berpirsên dewleta Turkiyê ya dagirker digel hêzên tariyê yên terorist ku navê artêşa azad a Sûriyê li xwe kirine, li ber çavên civaka navnetewî tewanên mezin ên kesnedî dikin, bi darê zorê şêniyên deverê ji gund û bajaran hildikin, Turkmen û Ereban li şûna wan cîwar dikin, dar û daristanan dişewitînin, şûnewarên Kurdan û her tiştê têkildarê dîrok û hebûna wan in, wêran û winda dikin!. Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku tewaneke dijî mirovatiyê li Efrînê birêve diçe, pêwiste hemû mirovatî li hember wan kiryarên hovane serî hilde, û da ku artêşa Turk a dagiker ji xaka **Efrînê** û hemû deverên Sûriyê vekişe û ew tewanbarên devbixwîn li hember dadgehine dadmend bêne darizandin, kar û xebateke îjdil bike.

Digel hemû derd, êş û azaran, gelê me bê hêvî nabe, serî naçimîne ew ê birîna xwe ya kûr derman bike, kar û xebatê ji bo jiyaneke aram, azad û bi rûmet bike, û serkeftin ji doza wî re ye!.

Li dawiyê, di vê bîranîna giranbuha de, em pakrewanê çand û zimanê Kurdî **Kemal Henan** ku sernivîserê rojnameya **NEWROZ** bû, û birêz **Salih Osman** ku endamekî çalak ê kovara **El-Hîwar** bû, herweha nivîskarê zimanê Kurdî **Diljar Seyda** yê ku par mîna vê demê koça dawî kiriye bi rêzdarî bibîr tînin. Herweha em gelê Kurd û rewşenbîrên wî yên xemxurê dozê pîroz dikin, gurzek gul, nefel, nêrgiz û kulîlkên rengîn diyarî giyanê nemir **Miqdad Bedirxan** û hemû xebatkarên dilsoz ên gelê Kurd dikin û dibêjin :cejina we pîroz be!.

------------

* Deqa gotina Kovara PIRS û weşana NEWROZ ya ku, hatiye xwendin di ahenga ku, roja Înê 26.04.2019an, partiya Elwehdê (Yekîtî) li gundê Dirêcîkê – Cizîrê lidarxistî.

# Ma bi rastî ziman dayîk e

**Mihemed Qere Hesen**

Di dîroka zendegeyan de hatiye tekez û dupatkirin, ku gava guhartinên bingehîn di pêkhatên mêjiyê mirov de çêbûne, bi taybet di qaliq de ew bû nevenda hiş, û rewişta mirov werbigire , û qatê di bin re cihê daxwezên bê vîn ( xerîze ) wek ma bi jiyana ajalan re hevbeş ma. Berhemê wê guhartinê jî raman bû. Ramankirinê jî hêşt ku bi xwazê û diyardeyên»rûdaw» wê birame û pê re têkiliyê bike, wê têkiliyê jî hêşt ku herdu alî hukariyê bi hev bikin. Ango mirov yek ji berhemên xwazayê yên zendege ye.

Bi demek pir dirêj û ne nas, mirov diramî û bi mirovê hişmend hate bi navkirin. Aya berî mirov deng bike diramî, ji ber wê ziman ne bû raman û bi rêya wî xwe derbirî, li vir rola emrazek daxwez, derbirîn û hevghêştinê lîst.

Li gor têklî û jiyana mirov di heyamên suriştê de û şêweya xwerinê ya serek e şîvên bi êgir dihatin çêkirin, û têkariya wan li wî û li ber rola pêgerekî û pêwîstiya derbirînê, wî kanibû dengkira. Gava mirov axivî, ziman afirî. Ango ziman wek ramanê bû berhemê mêjiyê mirov. Vêca ziman zarok e, mirov dayîk e, zarok şêrîn û kezeb e, parek ji heyîna wî ya henasî û derûnî ye û jê re bûye nasnam e.

Gotina ku li ser zar û zimanan digere, ku ziman dayîka mirov û netewan e, ev dûrî rastiya zanistiyê ye. Lê gava rol û bandora zimên bilind hate nirxandin û girîngiya wî di pêşketina netewan de baş hate zanîn, raku payebilindiyê pê din bi dayîkê hate nimandin.

Zimanên ku ji despêka axftina mirovan ve û pê hatine nivîsandin û şaristanî tomar bûye, îro bikarnetê û di tomargehan de maye, mirov kane bi zimanên di belgeyan bi nsv bike. Minak zimanê Somerî, tevî bêjeyên wî li hemî zimanê herêma me belav bûne.

Pir netew hene zimanê xwe winda kirine, lê nasnama xwe ya netewî winda nekirine. Û îro xwedî dewlet in. Piraniya miletên Emrîka Latiniyê zimanê xwe yê resen bikarnîn û Spenyolî yê ji Spanî û Pertkuzî peyda bûye. Û bûye zimanê netew û dewletên wan.

Hin dewletên Efrîqî zimanê Firensî bûye yê gel û dewletê.

Mirov dikare bêje belikî netew zimanê xwe ji ber sedemên di ser şiyan û pêkanînê wî re be winda bike lê hiş û hestên xwe winda nake.

Ji ber pêwîstiya zimên û rola wî dijminê û netewa Kurd baş dizanî. Ji ber wê qedexe dikir, nedihêştin ku were xwendin û nivîsanadin. Kurdan ji ber zimanê xwe ve qelengên pir biha dane. Ji ber ku Kurd û neyarên wan rind zanibûn ku ziman şana hebûna wan e, û bûye emrazek ji rizgarkirinê re.

# Çawa 21 Sibatê bû Roja Zimanê Zikmakî

**Mahmud Lewendi**

*21 sibat 2019- Facebook*




Di 21ê Sibata 1952ê de, ji bo ku zimanê Bengalî jî li gel zimanê pakîstanî (ûrdû) bibe zimanê fermî, xwendekaran xwepêşandaneka mezin amade kirin. Polîsên dewleta Pakîstanê êrîş bir ser xwepêşanderan û ji wan 11 kes kuştin. Lê Bengladeşîyan ji bo mafê zimanê xwe yê zikmakî dev ji têkoşîna xwe bernedan. Û 21ê Sibatê jî wek roja şehîdên zimanê xwe bibîr dianîn. UNESCO jî dixebitî ku rojekê bike roja zimanê dayikê. Bengladeşîyan ji bo vê rojê, 21ê Sibatê pêşnîyar kir. UNESCOyê jî di 17.11.1999ê de ev roj, yanî 21ê Sibatê, wek Roja Zimanê Zikmakî qebûl kir.

# Li bajarê Êsinê ya Almanî jî semînarek li ser rojnamegeriya pelikî pêk hat

Roja 27 ê Nîsanê, li Navenda Hêlîn a bajarê Êsin - Almaniya Rûniştinek guftugoyê li Ser rojnamegeriya kurdî ya pelkî pêk hat, hin rewşenbîr û berketiyên zimanê Kurdî beşdar bûn, Desteya sernivîser a kovara Elhîwar şevbuhêrk bi rê ve bir, gelek nêrîn û pêşiniyar ji bo pêşxistinê hatin pêşkêkirin.

# Şandeke Partiyê bi serokatiya Birêz Mihyedîn Şêx Alî Seredana goristana Pakrewanan li Qamişlo kir



Îro, 28.04.2019, şandeke serkirdayetiya Partiyê bi serokatiya birêz Mihyedîn Şêx Alî seredana Goristana Saroxan a pakrewanan li Qamişlo kir û qeflek gul danîn ber serê wan û sûretê destpêka Qurana pîroz li ser giyanê wan ê pak hate xwendin.

# ÇIYAYÊ XEWNAN



**Hind Ebdelo**

Li vir, li ser riya, Çiyayê Xewnan hemû giyan mirin û tenê laş man. Li vir ji dest dîmenên ku bi êşê dagirtî bûn Xweda got: Nema ez heme û nema ez ê hebim. Li vir, li rawestgeha Çiyayê Xewnan berê Efrîniyan tev hilhatina rojê ji pişt çiyayê Lêlûn xewnên xwe bi tavên rojê dirêsan, ew xewn li ser zinarên vî çiyayî rê dixistin û ji sîngê kaniya Basûtê ew dimêjandin. Her ku dema rojavabûnê bihata bayê rojavayî radibû, wî ev xewnan bi xwe re dibirin serdangehên asoyên sor û ev xewn pîroz dikirin. Di dîroka 152018/3/ de ev Çiyayê Xewnan bû çiyayê birîn û çiyayê xemgîn. Riya wî ya ku berê xewn ji Efrîniyan re dirêsan bû riya ber ve windabûn, nediyarbûn û koçberbûnê. Li vir karwanên koçber bi dilekî tijî êş û kul di vê riyê re hilkişîn, her ku wan gavek ber bi jor de davêtin axa Efrînê bi piyên wan digirtin û ew berve xwe vedigerandin. Lê giriyê zarokan û tirsa di çavên wan de bêlî bûbû dihîştin ku dê û bav xwe ji axa Efrînê bi dûr bixin tenê ji bo zarokên xwe ji mûşekên Tirkan û çeteyan biparêzin. Li vir hemû xewnên ku berê hatibûn hûnandin bi aleke reş hatin pêçan û di gornên asoyên bi dûmana mûşekan dorpêç bûbûn de hatin binaxkirin. Li vir zarokekî biçûk bi destê bavê xwe girtibû û di kaşê çiyayê xewnan re hildikişîn. Dema gihîştin nîvê rê dengê mûşekan bi hêz hat, bavê zarok li pişt xwe nêrî û zarok jî mîna bavê xwe li pişt xwe nêrî. Zarok dema ketina mûşekan dît wî got: Bavo mûşek li kolana me ketin û mala me jî hilweşî. Bavê zarok zarok ji ser rê rakir û kire hembêza xwe. Kalek li nêz wan li ser zinarekî rûniştibû, wî jî li Efrînê dinêrî û gotinên zarok dibihîstin. Kalê ji zarok re got: Lawê min mexeyide eger mala we hilweşî bila mala min a we be, mexeyide lawê min tu hîn zarok î û ev derdan ne ji temenê te re ne. Li ser riya Çiyayê Xewnan jinekê keça xwe ya çend mehekî kiribû hembêza xwe û ew ji rondikên xwe dimêjand. Zarokê her ku rondikeke diya xwe dimêjî dengê giriyê wê bilind dibû û dengê giriyê wê dikete guhên hemû gelê karwanê. Her rondikekê êşeke giran dikire hindir zarokê, rondikekê ji zarokê re digot tu keça şehîd î, tu bê welat î, tu niha koçber î û li çolê bê mal î. Her ku zarok têr rondik dibû dilê wê ji pirbûna derdan kal dibû. Li ser riya Çiyayê Xewnan zarokekî 8 salî di vê riyê re hildikişî û her ku wî gavek davêt wî bi pênûsa di destê xwe de li ser zinarên vî çiyayî nîşanek çê dikir. Ez li pişt zarok dimeşîm û dema min nîşanên wî li ser zinaran dîtin, min di meşa xwe de lezand û ez berve wî zarokî ve çûm. Dema gihîştim ba zarok min jê pirsî: Lawê min tu çima nîşanan li ser zinaran çêdikî? Zarok got: Xaltîka min ez zarokek biçûk im, ez bi riyan pir nizanim lewma ez ji xwe re riya vegerê nîşan dikim. Min bi destê zarok girt û her ku me gavek davêt min û zarok nîşanek li ser zinaran çêdikir. Min û zarok mîna hemû gelê Efrînê riya vegerê ji xwe re nîşan kir lê ez û zarok ta niha koçber in. Riya Çiyayê Xewnan ne riyeke normal bû. Ev rê êşek giran e di dilê her Efrîniyekî de maye. Ev rê qet li ba Efrîniyan jibîr nabe çimkî her gavek ji vê riyê dîrokek bi xwe ye û ew êşên Efrîniyan ên ku wan di van rojên 15, 16 û 17 Adarê de kişandinî vedibêje ye.

## Li Almanya, şevbuhêrkek wêjeyî li ser dîrok û rola Kovara PIRS û El Hîwar hate lidarxistin

Roja 26 ê Nîsanê 2019 an, Li navenda Yasa Şevbuhêrkeke wêjeyî hate lidarxistin. Tê de, D.Azad Eli li ser herdu kovaran Pirs u Elhîwar Axivî (ji despêkê heya niha). Herweha mamoste Elî Ceifer li Ser rojnama Dengê kurdistan li Europa dihate weşandin axivî û Rojnemevan birêz Arif Cabo jî li ser ronamegeriya Elêktronî Axivî.

# Cejna Çarşema Sor ...
# Li xwişk û birayên me yên Êzdî pîroz be



**Çarşema Sor ***

Cejina Çarşema Sor cejina herî mezin e di nav civaka Êizdî de. Ev cejin her sal di çarşema berî ya meha Nîsanê tê pîroz kirin. li gorî ola Êzidî di çarşema berî ya meha Nîsanê de kinyat yan jî gerdûn hatiya avakirin. di vê cejinê de civaka Êzidî hêka dikelînin û renge reng dikin, ew hêk jî temsîla nû avakirina gerdûnê dikin. Di aliyê zanistî de ji dibêjin ku diniya yan jî gerdûn piştî teqîna mezin ku bi zimanê Ingilîzî dibêjinê (Big Bang) pêkhat gerdûn hat avakirin. Civaka Êzidî bi hezarên sla vê cejinê pîroz dike. Vê civakê beriya her kesî şekl û çawa avakirina gerdûnê dizanîn. di cejina Çarşema sor de civaka Êzidî hêkan dikelînin ji ber ku heye hêk neyê kelandin wek di hundirê hêkê dê şeklê gerdûnê çênabe. ji ber vê yekê divê hêk bê kelandin ji bo ku şeklê gerdûnê bide. wek tê zanîn di nav hêkê de şeklê rojê jî heye, ew jî zerka hêkê ye. serê sibeha cejinê her kes zû ji xew radibe û berê xwe dide rojê ji bo hemû diniyayê ibadet dike, piştî wê ji bo mêhvana serbir tê serjêkirin û şîrnahî tê belavkirin û hêk bi hemû rengan tên rengkitin ji ber ku dema gerdûn hat avakirin her der bi gulên renge reng hat xemlandin. serê sibê her kes berê xwe dide çolê kulîlkên sor berhev dike û dibe mal di gel qalikên hêka bi deriyê malê ve dikin wata vê yekê jî, ji bo ku ji her êrîşê bên parastin. her wisa di roja cejinê de qalikên hêkê her kes dibe nav dexil û danê xwe ji bo ku Xwedê berket bavêje nav. serê sibê yên ku miriyê wan yên nû jiyana xwe ji destabine hene diçin ber mezagehên xwe yên pîroz û serdana miriyên xwe dikin, her wisa xwarinê dibin li wir belav dikin. di roja cejinê de nabê kes biçe ser karê xwe. her wisa di meha nîsanê de nabê kes bizewice rêzgirtin ji meha pîroz a nîzanê re.

gelek cejinên Êzidiya hene her yek ji wan cejina wata xwe ya tayîbet heye û hemû cijin grêdana xwe bi xwezayê re heye, mînak. Êzidî di meha 12an ji her sal sê rojan xwarin naxwin yan jî bi rojî dibin, ev her sê rojî dikevin sê rojên herî kurt ji salê. civka Êzidî van her sê rojiyan diger ji ber ku her diçû roj kurt dibû û şev dirêj dibû. Êzidî bi rojî bûn, sê roja xwarin ne xwarin heya roj vegeriya

---------------

** Wekîpîdya*

# Li Qamişlo helbestvanê kurd Seydayê Dilbirîn koça dawî kir

Roja 25ê Nîsanê, li bajarê Qamişlo, piştî nexweşiya penceşêrê, dilê helbestavanê Kurd Ferhanê Hesê yê ku bi navê Seydayê Dilbirîn dihate naskirin, rawestiy. Bi beşdariya birek ji rewşenbîr, nivîskar û hezkerîn wêje û zimanê Kurdî, termê wî li goristana Hilêliyê hate veşartin.

Sala 1946an, ew li gundê Çaxir bajar ê girêdayî Amûdê hatiye dinê, ji ziman û helbesta Kilasîk hez dike û hin dîwanan diwşîne mîna(Gulistan, Mizgîn û Derdê welat).

Hêjayî gotinê ye ku gorbihuşt di tevgera niştimanî ya Kurdî de kar û xebat kiriye û ji bo wê dozê ji bal dezgehên ewlehiya dewleta Sûriyê hatiye zindankirin.



Bila Cihê Seydayê Dilbirîn bihuşt be, serê malbat û helbesta Kurdî sax be.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**